HIMBÊZKIRINEK DI GUNEHBÛNÊ DE

Îhsan Hesen

Hezên min û
Henasa te
Nehêniyeka şaşe
Hero digel
Çirkîna demjimêrên
Şevbêriyên tehil de
Di xewnên mandî û
Şehwetên zûhakirî de
Dibûrin
Tu li ser kîş hêlê
Mêyatiyê dialisî?
Heke tu rastî
Hez ji agirî dikî
Xwe di min werke
Hind zû lêvên xwe ranke
Pirotokolên xwe yên hezkirinê
Bi maçan îmza bike
Nihêniyan
Di gel rengê bûharê
Têkel bike û
Singe xwe bi ramî
Bi posterekê
Giyan perestî û
Bi sihra pirça xwe
Bergiriyê ji gilîzankan bike
Netirse!
Ez dê te di sifra xwe de
Havêjim
Pertûkên hişkirî
Xweşiyên dikujin
Tu bêhna sîlaveka
Bûharî yî

Ez xwe li ber te nagirim
Hezên te û rengê şevê
Gunehên aşiqan
Di perêsin
Were
Leşê min li ser
Kirasê xwe rabîne
Da semayeka bê deng
Di gel stêran bikin
Bêhna min bidize û
Dê bêhna te dizim
Min fêrî tama guneha bike û
Hêdî berde li ser
Xerîbî ya xwe
Min bîne pêş
Xwe du dil neke û
Da bû êk bimirin.